# Lue lapselle.



Kurmanji / **Kurmancî**

# Zarokek ku jê ra tê xwendin, dixwaze...

**Rêbera Dêûbavan:** Girîngiya xwendinê ji bo zarok

## 1. Xwebaweriyê bi dest bixe û hîn bibe ku hevalekî dadmend be

Li gorî lêkolînan, zarokên ku berdewam ji bo wan tê xwendin, hişyartir û hevxemtir in û ev yek dibe sebeb ku ew endamekî komekê bin û digel zarokên din bilîzin.

## 2. Hînbûna zehftir û berfirehtir a peyvan ji bo tecrubeyên xwe

Lêkolîn nîşan didin heta temenê sê saliyê, zarokên malbatên ku pirtûkan dixwînin, 20 miliyon peyv zêdetir ji zarokên malbatên ku pirtûkan naxwînin, bihîstine. Bazirneya peyvan a mezintir, raderbirrîn û hilêxistina nêrînên xwe ji aliyê zarok va hêsantir dike.

## 3. Li malê pirrbêjtir bin

Malbatên ku gellek pirtûkan dixwînin, zêdetir bi hev ra diaxivin. Xwendina bi dengê bilind ji bo zarokan, peywendiyên malbatî bihêzztir dike. Bi rêya çîrokan, hûn dikarin rûdan û serpêhatiyên rojane bixin ber behsê û alîkariyê bidine zarok da ku bi hevraz û berjêrên mezintir ên jiyanê ra rûbirû bibe.

## 4. Li dibistanê serkeftîtir be

Zarokê ku beriya destpêbûna dibistanê digel çîrok û helbestan nasyar bûye, li dibistanê bi pêş dikeve û destkeftine zêdetir anegorî zarokekî ye ku jê ra nayê xwendin.

## 5. Destpêkirineke baş di jiyanê da hebe

Atmosfer ş hawîrdora xwendinê li malê bandorine demdirêj li jiyana zarok dike. Mezinên çalak, pirsokî û armancşop di heyama zarokatiyê zêdetir ji asta asayî ji wan ra hatiye xwendin. Ew di mezinatiyê da zêdetir pirtûkan dixwînin.

§

**Ev mafê her zarokekî ye ku bi zimanên girîng ên rojaneya xwe pirtûkan bixwîne.**

## Xwendewariya pirrzimanî xelatek e




**Gelo te dizanî?**

- **Zimanê Yekem an jî qaşo Zimanê Dayîkê bingeha her tiştî ye.**
- **Dema ku zarok Zimanê xwe yê Yekem bi başî bizane, ev alîkariya wî/wê dike ku zimanên din jî hîn bibe.**
- **Xwendewarî û zanîna bi Zimanê Yekem her wiha vediguhere pisportiyê di zimanên din da jî.**

Zarok ji xwendina bi dengê bilind bi hemî zimanên xwe yên rojane sûd û behreyê werdigire. Mal û perwerdehiya heyama zarokatiyê bi hev ra li xwendewarî û zanîna pirrzimanê ya zarok miqate dibin. Dêûbav dikarin ji bo piştevaniya ji zarokê xwe li malê, hem bi Zimanê Yekem (Zimanê Dayîkê) û hem jî bi zimanê ku ew hîn dibin, ji pisporan daxwaza rênîşandan û yarmetiyê bikin.

# Pirtûkek ji bo hemî temenan guncan e



### Nûza anku zarokên nû-welidî bîserine hişyar in

Dengên nasyar ên endamên malbatê digel rîtm û lezên wan ên guhêrbar, hisê zimanê yê zarok têr û dabîn dikin. Zar û zimanekî yekem û xwecihî yê dewlemend xelata herî baş ji bo zarokekî ye.

### Nûzayên 6 mehî di destpêkê da pirtûkekê ek pêlîstokekê meraq dikin, pirtûkê bêhn dikin, diçêjin û tam dikin û pê dilîzin. Kesayetiyên xwerû û rengên ronî yên pirtûkeke nazik balkêş in.

### Zarokên 1 salî ji çîrokên rojane hez dikin

Çîrvanok û helbestên rîtmîk piştgiriyê didin pêşketina axaftina zarok. Kurteçîrokek an lorîneke beriya raketinê, zarokî aş û aram dike.

### Zarokên 2 heta 3 salî peyvên nû hîn dibin.

Demên çîrokê wextekê dikevin rewşa danûstandin û zêdetir enteraktîv dibin ku mezin ji zarok bipirse di dîmenên pirrtûkê da çi diqewime. Dema ku şiyana zarok a lêhûrbûn û terkîzê baştir bibe, êdî dema wê ye ku ji pirtûkên texteyî (board books) berê xwe bidî pirtûkên dîmenkî.

### Zarokên 4 heta 5 salî dest bi hînbûna alfabeya (ABC'ya) jiyanê ji nav çîrokan dikin

Çîrok vê derfetê didie zarok ku bi rihetî hesta tirsê bikin û digel hestên cûrbicûr hevxemî bikin. Çîrvanok û helbest zarokan teşwîq dikin ku bixwe bi ziman bilîze.

### Zarokên 6 salî êdî li ser baskên xeyalan difirrin

Zarokek êdî bi bêhnfirehî çîrokeke dirêjtir guhdarî dike. Behs û gotûbêja derbarê babetên xwendî, mezinan jî kêfxweş dike.

### Zarokên 7 salî berpirsê pirtûk û nameyan in

Zarokek tîpên alfabeyê meraq dike û dixwaze ku bixwe wan bixwîne. Hînbûna xwendinê xaleke veguherînê ya girîng e ku hêjayî cejnandin û pîrozkirinê ye. Demên vegotina çîrokan navbera mezin û zarok hîn jî bo heyameke dirêj ji bo zarok girîng e.

